| | |
|---|---|
|  *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)* |  *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd* |


# Tîrêjên Çarşembê

**Xelek - 8**

# Diyardeyên Hevbeş
# di navbera Atûnî û Zerdeştiyê da

## Lêkolînek li bingehan:

*Atûnî* û *Zerdeştî* du saziyên ayînî serbixwe ne. Ji bo her yekê ji wan afrînerê wê, hêrzanvanê wê û pêximberê wê heye (*Exnatûn* / *Zerdeşt*) û dîtina xwe ya gerdûnî, ramana xwe ya ayînî (îdeologî), delîndêzên (şêwazên perestinê) wê, perestinên wê, dawer û sîmbolên wê hene. Herwisa, her yek ji wan xwediya bingeh, nirx, sincî û rewiştên taybete û xwediya yasa û zagone. Ji lew ra, em angaşt nakin û nabêjin ku "*Lavaya Rojê*" ya Exnatûnî tevaya *Atûniyê* derdibire û dinimîne û ne jî dibêjin ku "*Xorşîd-Yaşt*" ya Zerdeştî, tevaya *Zerdeştiyê* derdibire. Ji ber ku baweriyên ayînî - çi biçûk bin û çi mezin - gelek zore ku ew bi lavijekê yan çend lavijan bêne şîrovekirin.

Lê belê, bi alîkariya lavijên taybet yên her ayînekê, em dikarin bi seriyê wî tayê dezî bigirin, yê ku me digihîne wan bingehan, yên ku dîtina gerdûnî ya wê ayînê li ser hatiye avakirin û hem jî wek raman û felsefeya wê (îdeologiya); wek saziyeka çandî, civakî, sincîtî, derûnî, siyasî, leşkerî û aborî. Wek çawa kesê geolog (zemînnas) ku li cihekî taybet li ser zemînê bîreka yan jî quleka kûr dikole daku bi rêya wê hevedudaniya çînên wê herêmê nasbike, em jî dikarin bi rêya lavijan bigihînin nasnameya bingehîn ya ku ew ayîn li ser hatiye avakirin.

Bi vê dîtinê û ji bona vê yekê "*Lavaya Rojê*" li ba herdu pêximberan *Exnatûn* û *Zerdeşt* ji me ra girînge. Divêt em bêjin ku ji bermaya exnatûnî gelek tiştên biçûk mane, ji ber ku oldarên xwedawend *Amûn*, yekser piştî wexerkirina *Exnatûn* li dijî baweriya *Atûnî* serî hildan, hewldan ku wê tineyî bikin û wisa tenha hin tiştên biçûk man. Lê belê, *Zerdeştî* piştî kuştina Zerdeşt zindî ma, tevî ku pir hate guherandin pê leyîstin. Gava em li van herdu "*Lavayan*" bi hûrbînî dikolin, em ji hin agahdariyên dervayî van jî alîkariyê distînin; bi taybetî jî ayîna Zerdeştî. Diyardeyên here balkêş ku bêhtir bala me kete ser, ev bûn:

## Hin diyardeyên Atûnî - Zerdeştî:

**1) Baweriya yekxwedayî**: Wisa tê xuyakirin ku *Exnatûn* û *Zerdeşt* bi xwedayekî yakane ji bo vê cîhanê bawer kirine. Raste ku *Exnatûn* hin caran xêr û bereketa xweda *Atûn* li ser welatê Misirê (bakur û başûr) tîne ziman û *Zerdeşt* jî di hin lavijên din da ji *Ahûra-Mezda* tika dike ku berhemên welatê Ariyan pir û dewlemend be, û ku di ber welatê Ariyan da berevaniyê bike[1]. Lê belê, ev taybetmendî vedigerin ser çarçewa gerdûnî ji bo xwedawendiya her yekî ji

wan; *Atûn* û *Ahûra-Mezda*. *Exnatûn* di axaftina xwe da taybetmendiya cîhanî ya xwedawend *Atûn* piştrast dike û dibêje: "**Te ev cîhan afirand**"[2].

Ji hêla din va, *Zerdeşt* jî di peyvên xwe da cîhanîbûna *Ahûra-Mezda* piştrast dike, gava dibêje: "**Afrîner Ahûra-Mezda ew afirandiye, daku xêr û qenciyê ji bo seranserê cîhanê biparêze**"[3]. Û ew derbarê av, çem û robaran dibêje: "**Avno" Em we pîroz dibînin ku hûn ji bo paqijiyê diherikin, em we ji bo hemû cîhanê dixwazin**"[4]. Û dîsa dibêje: "**Emê bifikirin, emê bêjin û emê wisa bikin ku her tişt û heyberê heyî bi başî û rindî ji bo tevaya cîhanê be**"[5].

Ji vê baweriya *Atûnî* / *Zerdeştî* ra, di zanistiya ayînan da, yekxwedayî tê gotin. Li dijberî wê pirxwedayî heye, yanê ew ayîna ku bi hebûna pir xwedayan ji bo her desthilateka gerdûnî bawer dike. Bi gelemperî, ew xwedayên êlîtî û neteweyî ne. Ji lew ra, em dikarin bêjin ku *Exnatûn* û *Zerdeşt* ew pêximber û daxwazdarên yekxwedayiyê ne, û ji wê baweriyê bûn ku tenha yek xweda li ser vê cîhanê serdare.

*Zerdeşt* di "*Lavaya Rojê*" da dibêje: "**Dema roj germahiyê dide, hemû xwedawend radiwestin, bi sedhezaran ji wan**". Belkî li vir bê bawerkirin ku hatina navê xwedawend pirxwedayî ye li hember *Ahûra-Mezda*. Lê belê rastî ewe ku peyva "xwedawend" di pirtûka pîroz Avesta ya Zerdeştiyê da tê maneya "ferişt (melayîke)" û nayê maneya ku hin xwedawendên din bi *Ahûra-Mezda* ra taybetmendiyên xwedayiyê parvedikin.

**2) Taybetmendiyên Xwedayî**: Piraniya taybetmendiyên xwedayî yên *Atûn* û *Ahûra-Mezda* gelek dişibihin taybetmendiyên xweda di hersê ayînên yekxwedayî da (Cihûtî, Krîstiyanî û Îslametî). Ev bi awayekî pir zelal di "*Lavaya Rojê*" da li ba *Exnatûn* û *Zerdeşt* û di pirtûka zerdeştî *Avêsta* da aşkera ye. Di Îslametiyê da ji van navan ra dibêjin "navên xweda yên spehî"(esmau llahilhusna). Heger em van navan ji şêwazê wêjeyî ku di gotinên *Exnatûn* û *Zerdeşt* da hatine, derbixin, ewê bibin: "Afrîner, avakarê erd û asîman, yê zindî, yê hemdem, yê qeyûm (xwediyê desthilata gerdûnî), yê dilovan, yê zana, yê payebilind, yê şiyandar, yê aqilmend, yê jiyandar, yê mafdar, yê dademend, yê dayewer, yê zîba, û hwd[6].

**3) Ronahî û Şahî:** Em di lavayên *Exnatûn* û *Zerdeşt* da ti şop û nîşanan nabînin ku *Atûnî* û *Zerdeştî* du ayînên wisa ne, yên ku nav di mirovan didin ku herin talan, standina bi darê zorê û xwînrêjiyê bikin, bi behaneya ku mirovan ji bêbaweriyê rizgar bikin û bînin ser baweriya rasteqîn. Taybetmendiya giştî ya wan herdiyan ronahî, şahî û qencî ye. Bi tundî li ser wê yekê rawestiyane ku taybetmendiyên jîndarî, geşbûn, zîbayî û kamiranî bi xweda *Atûn* û *Ahûra-Mezda* va hatine girêdan. Di vî warî da ji peyvên *Exnatûn*: "**Te zemîn bi zîbayiya xwe tijî kir. Tu zîba yî, zemîn çiqas xweşe dema tu hiltêyî, hemû sewal bihna xwe vedidin, dar û ber geşdibin, teyr û tilûr difirin, hemû pez semayê dikin**".

Û ji peyvên *Zerdeşt* di "*Xorşîd-Yaşt*" da: "**û bexteweriyê hildibijêrin, bexteweriyê pêşkêş dikin û bexteweriyê didin. Geşbûnê didin cîhanê û nirxdariyê didin rastiyê. Rastî ji xêr û bereketan ya here başe**". Vê diyardeya baldariya bi bextewerî û şahiyê di *Zerdeştiyê* da bala *Geoffrey Parrinder* kişandiye, ew dibêje: "**Ayîna Zerdeştiyê ayîneka bextewerî û şahiyê ye.... ji bingehên vê ayînê ye ku mirov bi jiyanê şahbibe û alîkariya yên din jî bike ku ew jî pê şahbibin**"[7].

**4) Cêwîtiya Ronahî û Tarîtiyê**: Ji "*Lavaya Rojê*" tê xuyakirin ku dema dilovaniya xweda *Atûn* û *Ahûra-Mezda* diçe, tarîtî li ser cîhanê dibe serdar, şer û têkçûn belav dibe. Ji gotinên *Exnatûn*: "**Dema tu di asoyê xaherî (rojavayî) da diçî, tarîtî li zemînê mîna mirinê dibe**

**serdar. Her şêrek ji lana xwe derdikeve û hemû ejdeha jehra xwe berdidin**". Û ji gotinên *Zerdeşt*: "**Heger roj hilnetê, wê îblîs vê cîhanê tar û mar bikin**".

Xuyakirina herdu xwedayan *Atûn* û *Ahûra-Mezda* di (tîrêja rojê) da, jiyan, geşbûn û bexteweriyê dide cîhanê û dema tîrêjên rojê windadibin cîhan dikeve bin zora tarîtiyê û her tiştê ku bi tarîtiyê va girêdayî wek azar, şer, têkçûn û mirinê. Gelo cêwîtiya ronahî û tarîtiyê di *Atûnî* û *Zerdeştiyê* da wêneyê pêşîne ji bo cêwîtiya Xweda / Îblîs di hersê ayînên yekxwedayî da (Cihûtî, Krîstiyanî û Îslametî)?. Em bawernakin ku emê li dervayî rastiyê bin, gava em bêjin: Erê.

**5) Peywendiya kîp û germ:** Di "*Lavaya Rojê*" da li ba *Exnatûn* û di "*Xorşîd-Yaşt*" da li ba *Zerdeşt*, ti hêrzanê nade me ku axaftin ji koleyekî kirêt da (wek ku hin oldar xwe bi nefsçûkî nîşan didin) ji bo xwedayekî gewre û zordar, bi tirs û sawîr tê hinartin. Taybetmendiya axaftinê di peyvên *Exnatûn* û *Zerdeşt* da ji bo xweda wisa ye, wek axaftina zarok ji bavê xwe ra (li ba *Exnatûn*), wî gotiye: "**Tu di dilê min da yî û kesek te baş nasnake, wek kurê te Exnatûn**".

Ev peywendiya kîp û germ di navbera xwedayê afrîner û mirov da, di lavayên *Zerdeşt* da bi awayekî ne yekser di "*Xorşîd-Yaşt*" da tê xuyakirin, û bi awayekî yekser jî di gotina wî da: "**Eve tiştê ku ez ji te dipirsim ey Ahûra! Bi min bide bawerkirin, belkî aqilmendekî weke te, wek dostekî te, hînî min bike, bi saya ku ez rêz û hurmetê ji te ra digirin**"[8]. Û di gotina wî da: "**Ez gazî te dikim ey Ahûra ku tu li min vegerî, alîkariya min bikî, wek dostekî ku alîkariya dostê xwe dike**"[9].

Evin aliyên hevbeş, yên here diyar di navbera "*Lavaya Rojê*" ya *Exnatûn* û "*Xorşîd-Yaşt*" ya *Zerdeşt* da. Di lêkolîneka dahatî da emê li sedemên vê diyardeya hevbeş bikolin.

Çarşemb, 20.05.2015

## Jêder:

[1] Avesta, Yaşt 8, ayet 36, rûpel, 452. Û Yaşt 13, ayet 43, rûpel 536 û ayet 44, rûpel 537.
[2] Wiliams Durant, dîroka Şaristaniyê, 2/175.
[3] Avesta, Yaşt, 10, ayet 102, 103, rûpel 499.
[4] Avesta, Yasna, Haytî 38, ayet 3, rûpel 131.
[5] Avesta, Yasna, Haytî 35, ayet 3, rûpel 127.
[6] Li Avesta binêr, Vîndîdad, Fargard 10, ayet 1, rûpel 312, Fargard 19, ayet 20, rûpel 355. Yasna, Haytî 1, ayet 1, rûpel 42. Yasna, Haytî 1, ayet 11, rûpel 45.. Yasna, Haytî 4, ayet 7, rûpel 59. Yasna, Haytî 50, ayet 10, rûpel 155.
[7] Firas El-Sewwah (Tehrir): Kana Dîroka Ayînan, pirtûk 5, rûpel 12.
[8] Avesta, Yasna, Haytî 44, ayet 1, rûpel 139.
[9] Avesta, Yasna, Haytî 46, ayet 2, rûpel 144.